

Mekan û Karakterê Sereke di Romana "Wehşê Di Hundirê Min De"




Aras HISO

*"Fêm bike gidî, weleh weleh, weleh wê li vî welatî
tiştêk neyê guhertin."*

Ji romanê

Di teknîka vegotina romanê de karakter dikevin bin hukmê mekanê, pê re jî hemû hêmanên metna romanê dikevin bin bandora wê û li gorî wê yekê dikeliye. Di vê romana "Wehşê Di Hundirê Min De" ya Helîm Yûsiv de jî, metafora Mekanê xwedî cihekî sembolîk, alegorîk û nepenî ye. Karakterê Sereke jî dîlê mekanekî wiha ye ku bi nakokiyên xwe re rû bi rû dimîne, heta ku di wî mekanê wekî bajar de dibe wehşek û tê de difetise.

Hêmanên romanê li ser erdekî rût bi riya karakter, zeman, mekan û vegotinê di qada wêjeyî de rola xwe dilîze. Mekan jî wekî elementeke sereke ya romanê bi roleke mezin di tevgerkirina karakter de dilîze. Çiku dema karakter rastî mekanekî tê, tavilê mekan bi hemû pêkhatayên xwe bandorê li ser psikolojiya wan pêk tîne. Mekan ji bo karakterên xwe dikare bibe atmosfereke hizrî, psikolojî, wijdanî û civakî jî. Gelek caran mekanên vekirî-berfireh û girtî-teng bi metodên cuda dibe



mijara gelek nîqaşan û her du nav dikevin nava hev.

Mebest ji wan her du mekanan çî ne? Nêziktedayîna nivîskar ji wan mekanan re çawa ye? Karakter çawa di wan her du mekanan de tevdigere? Em ê di vê kurtelêkolîna xwe de bidin pey şopa bersiva van pirsan û hewil bidin bi riya vê romanê van babetan biçespînin û bidin ber parzûna xwendin û fikrên xwe.

Di romanê de atmosfêra mekan û karakterê sereke:

“Têkêliya mekan bi karakteran re, ne tiştêkî awarte û ji nişkêve de ye, ew ji hêla dernûnî, jiyani, pskolojî û civakî ve kifş dike ⁽¹⁾”. Her wiha Kerîme Semar dide zanîn ku gelek rexnegir di “zeftkirina cureyên mekanî de pala xwe didin ser rêgeza ‘hevdan an jî dulaîteyên dijber’ di nava xwe de; jor/jêr, girtî/vekirî, teng/fireh, jîwarî/mecazî, niştecih/veguhestin û hwd pêk tên ⁽²⁾”. Li gor Rênas Jiyan; “Divê mirov ji têgeha ‘war’ê ango mekanê, bi tenê wek yekîneyên cihî yên weke gund, navçe û bajaran fam neke. Warên romanekê, li gorî çîroka wê berhemê carinan dikare bibe otogarek, carinan dikare bibe ‘bar’ek, carinan dikare bibe aşek û carinan dikare bibe ‘tuwalêtek’ jî⁽³⁾ ”. Romana “Wehşê Di Hundirê Mînde” jî mekanên ku bûyer lê diqewimin, bi wehşan mişt e. Li her mekanî wehş hene. Tê de girtin û binçavkirin bênavber didomin. Di welatekî(bajar) de qala hêmaya tirsê ya ku bi kirasê wehş û hovîtiyê hawirdor vedaye tê vegotin. Di vê berhemê de bi riya jiyana du nifşên karakterên mamoste û xwendevan

1- Semar,2013-2014, r.45

2- Hb, r.71

3- Jiyan, 2008, rr.158-159

4- Yûsiv,2018,r.12

5- Arda,2021,r.65

6- Filîk,2015,r.260

7- Şeta,2021,r.18

8- Korkmaz, 2015, r.82

(Alan û Salar) bi awayekî surreal, tirs, weşiyeta mirovan, mêtîngerî, desthiladarî, êş, zordarî û hovîtîyê bi awayekî ecêb tîne ber çavan. Serkarakterê romana me Salar e. Hemû bûyer û tevger li derdora wî dizivire û di gelek merhele û mekanên wekî bajar, atolye, zîndan, Qada peyker, goristan, mal, Beyrûd û mala Meryemê re derbas dibe. Bi hatina zarok(Salar) re çavekî dayîkê li peyker û cavê din li roviyê navika zarok bû ⁽⁴⁾". Ew di şevê de bi tirsê di ber peykerê ku di nîva bajêr de hatiye danîn ji dayîk dibe û jixwe bi wê tirsê di wî bajarî de, wenda dibe.

Bi çaroçveveyeke giştî ji me re qala mekanekî(welatekî) dike. Lê ev welat ji bo xwîneran mekanekî nepenî ye, Heke xwînerê ku li Sûriyayê dijî bala xwe bidin vê romanê ew ê bibînin ku zeman û mekanê wê li Sûriyayê ye, ji sala 1971`ê dest pê dike ta di sala 2016-17`an re derdikeve, heyameke ewqas dirêj dide ber xwe. Lê bi çavên xwînerêkî din "Serdema 90-93`an a Tirkiyê tê bala mirov, ji ber ku hemû şertên a niha di vê romanê de diqewimin û tê şaysandin wan rojan bi bîr dixin⁽⁵⁾".

Mehmet Narli jî dibêje "Teorî-zanên edebîyatê, mekanên edebî dişîbin dikê⁽⁶⁾" Ji ber dema ku em li mekanên romanê binêrin, em ê bibînin ku dişibe dikeke şanoyê

perde tê girtin û vedibe û bi awayekî dorveger karakterê Salar tê de dizivire. Hingê pirs ev e, mekan ji nivîskar û karakter re derd-sebebekî çawa ye? Ango mekan tenê amûreke ji bo tevinsaziya hûnandina romanê ye?

Nexwe mirov dikare bêje ku nivîskar xwestiye mekanê sergirtî bihêle û bike nimûneyeke giştî da ku her xwînerêk bi çavekî cuda li mekanekî wiha binêre. Her wiha em jê fêhm dikin ku ji bilî mekan û serkarakterên di romanê de gelek mekan û serkarakterên alegorîk ên dîtir di binhişê xwîner de ava dibin.

Dîstansa mekanên vekirî-berfireh û girtî-teng:

Mekanên xwedî hawirdoreke berteng û sînordar dikevîne beşê girtî, û yên berfireh û bê sînor jî, vekirî ne⁽⁷⁾. Helbet ev navlêkirina mekanaan ne li gorî endazyarî û bi pîvanên cihî yên erdnîgarî ve girêdayî ye, ew bi hişmendîya karakter ka bê wî mekanî bo xwe vekirî an girtî dibîne. Bo nimûne mirov dikare bêje ku dibe karakter li gorî psikolojiya xwe tuwaletekê cihekî vekirî bibîne û çolekê jî bo xwe cihekî teng bibîne. Ev mijar bi hizra vegotinê ya hundirîn û dîtina wî ya mirovî ya li ser mekanê ve girêdayî ye. Her wiha dibe ku zîndan bi girtina cihekî girtî ve were sînordarkirin, lê li gorî karakter dibe

ku bibe mekana plansazîkirin, fikirîn û ramana şoreşekê. Berûvajî wê ev yek ji bo mekanên berfireh-vekirî jî derbasdar e. Ji ber ku em van tespîtan di romanê de dibînin lewma em wê dikin mijara xwe. Her wiha mekanên têgihîştinê tene veguherandin, cihên bîranînê yên ku têkiliya mirov-cih ji perspektîfên pirsgerêkî nîşan dide; Ew ne tenê cîhek topografîk e, di heman demê de nirxeke ku wate çêdike û cîhana hundurîn a kesê ku bîranînan dihewîne jî nîşan dide⁽⁸⁾.

A-Mekana vekirî-berfireh:

Ew mekanên ku karakter tê de xwe rihet û aram hîs dike⁽¹⁰⁾. Li gorî pênasekirinê em di romanê de rastî mekanên wekî; goristan, mal, sandûq, Beyrûd, atolye û mala Meryemê tên. Piraniya lêkolîner didin diyarkirin ev mekan bi pîvanên xwe yên fonkisyonel ji bo serkarakter û nivîskar dibe bîrdanka hêza fikirînê û navenda ku xwe tê de gelek caran rihet hîs dike . Bo nimûne em dibînin ku Salar xwe di bajarekî bi hêzên istixbarat, gelacî û tirsê mişt e, aciz dibîne, ji bo ku xwe ji teşqeliyên pskolojîk dûr bixîne dixwaze hezkiriya xwe Meryemê bibîne. Ew tu mekanî ji

bilî goristanê aramtir nabîne. Heke em bi çavekî dîtir li mekana wekî goristanê binêrin, em ê bibînin cihekî qala mirin, dawiya jiyana û tirsê tê kirin, lê di romanê de ne wiha ye û karakter tê de berûvajî tev digere.

Di navenda xof û tirsê di nava miriyan de, baweriya wî ew e ku tenê mirî dikarin sira hezkirinê di nav gorên xwe de veşêrin. "Mirov li goristanekê li benda yara xwe be, ne karekî hêsan e. (...)Min dixwest ez li cihekî benda Meryemê bimînim û dûrî şubhe û gumanan be⁽¹¹⁾" Li vê navendê heyacana peyv, fikir û gotinên Salar ên evîni bi rihetî xwe didin der. "Di vî welaî de tenê baweriya mirovan bi miriyan tê⁽¹²⁾". Li vir ji aramiyê zêdetir jê re dibe navendeke ku îmana wî bihêztir dibe.

B-Mekana girtî-teng:

Ew mekanên ku navçe û pêkhatayên wê hatine diyarkirin ên niştecihbûnê ne ku mirov teng û fetisî hîs dike, ta demekê tê de dimîne çî bi îradeya xwe û çî jî bi ya kesên din. Ji ber vê yekê mekan bi sînoren hişî yên geometîk ve hatiye çarçoçekirin, her wiha nasîn û ewlehiyê eşkereke dike û

9- *Semar, 2013-2014, r.87*

10- *Semar, 2013-2014, r.74*

11- *Yûsiv, 2018, r.51*

12- *Yûsiv, 2018, r.49*

13- *Şeta, 2021, r.22*

14- *Yûsiv, 2018, r.35*

dibe ku bibe çavkaniya labîranta tirsê⁽¹³⁾.


Li gorî pênasekirinê; qada Peyker, dibistan, zîndan, bajar û kolan derbas dibe, lê Salar xwe di van mekanan de girtî hîs dike, ji ber ku tê de nefesa azadiyê nabîne. "(...) Her ku ji peyker ve nêzik dibûm, pê re tirsê min nezintir dibû⁽¹⁴⁾. Vê labîranta tirsê xwe di hişê salar de roj bi roj mezin dikir ta dawiyê "Tirsê min ew bû ku serokê kevirî bi wî destê xwe yê ku pê silavê li xelkê dike, bi qirika min bigire û min ber bi xwe ve bikêşîne⁽¹⁵⁾"

Di vî welatê mezin de, ji ber ku rêveberî, hêz , desthildadarî di nav destên "serokê nemir" de ye,

welatiyekî mîna Salar ji ber tirs û xofa xwe nikare di ber re bimeşe. "Xwedê bi xwe ku navê wê xwedê ye, nikare rewşa vî welatî biguhe-re⁽¹⁶⁾". Ew mehkûmekî vî bajarî dibe "Bajarê ku quncikeke parastî ji du evîndaran re tune⁽¹⁷⁾".

Encam:

Em dighêjin encameke wiha dibe ku gelek caran di romanê de, fikr û dûrbîna nivîskar û karakter ji mekanê re were guhertin û berûvajîkirin. Ji ber ku di hemû romanê de hêmaya tirsê serdest e, gelek caran di keleşanê Salar de tirs dilerize û berûvajî wê di tirsên xwe de her dem dixwaze ber



15- Yûsiv, 2018, r.30

16- Hb, r.82

17- Yûsiv, 2018, r.49

18- Korkmazî, 2015, r.80

bi kêfxweiyê ve bireve. Her wiha em dikarin xwe bispêrin nêrîna Korkmas ku tê dibêje “Di binge-ha vegotinê yên pêşketî yên weke romanê de, mekan rawestgeheke bi endîşeya hebûnê ve girêdayî ye; Ew di qalîteya “derve hundur” de cîheke ku mirovên naxwazin di herikîna bêdawî ya demê de winda bibin, pê ve girêdayî ye. Lêbelê, ev cîh ne tenê cîhek hawirdorê ye, lê cîhek dudil e ku ji hêla ‘xwe ya pirsgirêkê’ ve hatiye hilbijartin, ku Lukacs jê re dibêje ‘xweya têgihîştî’ (Lukacs,1985:45), da, ku

li dinyayê xwe guhdarî bike, nas bike û xwe bi cih bike. Bi fonksiyona xwe ya damezrîner re, ev qada bi pirsgirêk, bi awayekî qadeke ku karakter ji dinyayê qut dike û xwe/ava çêdike⁽¹⁸⁾”.

Jixwe Helîm Yûsiv ji aliyê mekanê ve berûvajî tevgeriyaye û navenda mekanê ji xwîner re bi dilnewazî, tirs, mirovatî û fikrên karakter bi semyolojiyên sembolîk û alegorîk ve aniye ziman.



Çavkanî:

- ARDA, Çorê, (2021), “Rexne û Rexnegirî-Wehşê-n Kedîkirî (Helîm Yûsiv, Wehşê Di Hundirê Min De)”, W.Belkî, Ç.1, Amed.
- YÛSIV, Helîm, (2018) “Wehşê Di Hundirê Min De”, W.Peywend, , Ç.1, Istenbol.
- JIYAN, Rênas, (2008), “Ji Şevê Re Çend Têgehên Dera Hanê-Di Romana Kurdî De War an jî Mekan”, Ceribîn-Rexne, W.Belkî, Ç.1, Stenbol.
- ŞÊXO, Fîlik, (2015) “Atmosfer, Mekan, û Meqesê Zêrîn”, kovara Wêje û Rexne, hej:5, weşanên Demane..
- SEMAR, Kerîme, (2013-2014), Teceliyet El-Mekan Fî Rîwayêt Eşbah El-Medîne Meqtûle, Teza Mastirê, Cezaêr.
- ŞETA, Omer, (2021), Ensîne El-Mekan Fî Rîwayê (Zakîret El-Mea) Lî Wasîn E'rec, Teza Derçûnê, Zanîngeha Emar Selcî, Cezaêr.
- DEHAN, Zehra, (2018), Elaqet El-Şexsiye Bil-Mekan Muxleq Wel Meftûh, Zanîngeha Şehîd Behîştî, Tehran.
- KORKMAZ, Ramazan, (2015), Yazinsal Okumalar/Kesit Yayinlari, Istanbul.